



Dr. Gouma  
Müllerstr. 56  
P.F. 210-16  
DDR-Berlin 1147

# KOMELEY XWENDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)



Jimar: 72

Dem : 27.5.1987

Bo/hemû Liqên Komela me ya têkoser  
Babet/ Yekitiyê

Li roja 25.4.1987 an civînek li Berlîna rojava pêkhat, niwênerên van rêxistinên têde amade bûn:

- 1- KSSE 2- AKSA 3- SOKSE 4- KOMCIWAN 5- YUKSE .

Civîn bi taybetî li ser van xalên han rawestiya:

- Rewsa gîstî. - Rewsa Kurdistan. - Tevgera Xwendekarî Kurd li Ewropa, û çî pêwîstê bête kirin.

Li ser wan xalan bi dirêjî hate gift û go kirin; bîr û baweriyên her rêxistinekê hate diyar kirin. Li dawî Civînekê baş dît ku hîç biryar neyên wergirtin û CIVÎNEK DIN LI 23,24/5/1987 an pêk bêt ta ku nawend Prag, AKSA(nawend Berlîn) û Lawanî Sosyalîst jî bi karibin têde besdarbin(nawend Prag em bi telefonê agehdarkiribûn ku ji ber vîza derçûnê nikarin di civîna 25.4.1987 an de amadebin).

Weha li rojên 23,24,25/5/1987 Civîn bi amadebûna niwênerên van rêxistinên pêk hat:

- 1- KSSE 2-AKSA 3- SOKSE 4-KSSE (nawend Prag) 5-Komciwan  
6-AKSA(nawend Berlîn) 7-YUKSE 8-~~Y~~Lawên Sosyalîst(van hevalan nameyek "texwîl" dabûn niwênerên AKSA û amadebûna xwe ji bo yekitiyê diyar kiribûn).

Di vê Civîna sêrojane de li ser hemû xalên siyasî hate biryardan, herweha biryar dîra ku Kongirê Yekgirtî di sala îsal de pêkbêt. Jiber bîr û bawerî liser sêweyê Kongirê cawaz bûn biryar dîra ku li nivê yekem ji meha pûşper(hizêran) civînek din bibe, têde Komîta Amadekirna Kongirê Yekgirtî pêkbêt, ji her rêxistinekê yek niwêner. Sê bawerî liser sêweyê Kongirê hebûn: Me û piraniya rêxistinên bi demokratî dizanî ku Kongire ji tev endaman re vekirî be; mafê her endamekî hebe bête Kongirê, deng bide û bête helbijartin. Ica em hêvîdarin ku kesên din jî bighijin vê rastiyê û tanî civîna bêt me û rêxistinên din bi biryara xwenî dawî agehdaribikin. Herdû baweriyên din weha bûn 1- sêweyê Kongirê vekirî niwênerî be. 2- tenha niwênerî (xwediyê vê baweriyê bawerîya xwe baş zelal nekirin).

Ligel silaên soresgêrî.

Komîta Birêveberî Gîstî

